Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1099 | 13-Îlon- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
☎ 423165

# Xêzên Neandertalan beriya 57 hezar salî

Şikeftên li dinyayê weke pencereyan ji bo mirov ji rabuhiriyê fam bike. Dema mirov di van pencereyan de li xêz û gravûrên dinihêre mirov leqayî gelek tiştên balkêş tê. Di hin şikeftan de şopên Neandertalan hîna jî hene. Ji xwe li gor zanyaran DNA'ya Neandertalan di roja îro de jî winda nebûye û insan bi DNA'yên wan dijîn.

57 hezar salan xêz kiribûn hatin dîtin. Ev resm û xêzên wan weke "hunerê Paleolîtîk" jî tê nirxandin. Şikefta li Newala Loire heya sala 1846'an jî nedihate zanîn. Piştî ku li wir rêya trênê derbas dibe û erdê dikolin ev şikeft tê kifşkirin. Lêkolerên ku li şikeftê xebitîn dan zanîn ku devê şikeftê 57 hezar sal berê hatiye girtin.



Bi wextê re Homo Sapiens pêşketîtir bûye û Neandertal ji holê rabûne. Lê şikefteke li Fransayê nîşan dide ku beriya Homo Sapiens werin Ewrûpa, Neandertal li wir mane û xêzên di şikeftan de jî nîşaneyên vî tiştî ne. Li Newala Loire ya Fransayê, di şikefteke de resmên ku Neandertalan beriya

Di şikeftê de li ser keviran gelek xêz hene. Lêkoleran van xêzên li wir bi yên Neandertalên din re dan ber hev. Hemû xêzên li wir bi destan hatibûn xêz kirin û bi zanebûn ev tişt kiribûn. Ev xêzên ku li vê şikeftê hatine dîtin xêzên herî kevn in ku bi destê Neandertalan hatine xêzkirin.

# 'Xwedî li xeyalên xwe derkevin'

Wênesaz Mêrdîn Ataş ya 16 salî dibêje, "Bi rêya xêzkirina wêneyan ez êş û azara gelê xwe vedibêjim, dikarim bi rêya wêneyên çanda



xwe ya Kurdî jî derxînim holê."

Mêrdîn Ataş dibêje, "Bi rêya wêneyê ez dixwazim êşên xwe û êş û azarên gelê xwe derxînim pêş. Kêliya ku ez tabloyekê dineqişînim, ji bo min ew tablo dibe hevalê/a min ê/a herî nêz û weke ku her kêliyê bi min re diaxive. Dema ku ez wêne xêz dikim, dixwazim bi rêya wêneyê wan hestên xwe yên kûr derxînim derve. Wêneyên ku min neqişandine, li ser çanda Kurdî û kamerayê ye, ji ber ku hezkirina min ji wan re heye."

Mêrdîn dibêje, divê jin dest ji xeyalên xwe bernedin û wiha dipeyive: "Jin divê xeyalên xwe pêk bînin. Pêwîstiya wênesaz bi axaftinê tine ye, ji ber ku wênesaz bi rêya tabloyê hestên xwe derdixe holê û mûzîkjen jî bi rêya stranên xwe xwe îfade dike. Zehmetiyên me yên di wêneyê de ew e ku alav biha ne û zêde peyda nabin. Ez bang li her ciwanê/î dikim da ku xwedî li hêvî û xeyalên xwe yên zarokatiyê derkeve."

# Şûnwareke yekane li deşta Şarezûrê

Ekîbeke hevbeş ya Rêveberiya Midûriyeta Arkeolojiyê ya Silêmaniyê û Zanîngeha Chubu ya Japonyayê, cîhekî girîng ê arkeolojîk li girê Yasîn Tepe yê li bajarokê Tancero yê ser bi Silêmaniyê dît. Dîroka vê şûnwara hanê heta bi zêdetirî 2 û 500 salan diçe.



Rêveberiya Arkeolojiyê ya Silêmaniyê bi hevkariya zanîngeha Japon a Chubu li bajarokê Tancero yê Silêmaniyê cihekî arkelojîk yê serdema Asûriyan dît. Ev şûnwara hanê ya weke Yasîn Tepe tê naskirin li deşta Şarezûrê ye.

Derbarê mijarê de Parêzgarê Silemaniyê Heval Ebûbekir piştî hefteyekê ya xebitîna ekîba arkeolojiyê de, berhemên gelek girîng û yekane yên arkeolojîk dîtin. Dr. Heval Ebûbekir da zanîn ku li gorî tebeqeyan, dîroka deverê ji serdema neolîtîk heta serdema Îslamê diguhere û got; "Ev tîme li ser berhemên arkeolojîk yên serdema Asûriyan dixebite û bermahiyên xaniyan, kolanan û cihên goran, tevî parçeyên arkeolojîk yên kêm û bêhempa yên serdema Asûriyan dibîne."

**Bi endezyarî hatiye çêkirin**

Herwiha Parêzgarê Silêmaniyê, Heval Ebûbekir da zanîn ku ew erdê keşfa arkeolojîk lê hatiye kirin, gelekî balkêş e û bi kevirên bêhempa hatiye xêzkirin. Em dikarin bêjin ku bi awayekî endazyarî hatiye çêkirin û gelek balkêş û girîng e."

Derbarê xebatên paşerojê yên di warê arkeolojîk û dîtina berhemên dîrokî de, Parêzgarê Silêmaniyê Heval Ebûbekir eşkere kir ku Rêveberiya Arkeolojiyê ya Silêmaniyê bi hemahengiya li gel ekîba zanîngehên navnetewî, kurseke perwerdeyê ji bo çend alavên ku di warê arkeolojiyê de têne bikaranîn, wê veke ku di testên arkeolojîk de bê bikaranîn.

Sudoku: Bersiv 10

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 8 | 2 | 6 | 4 | 5 | 1 | 7 | 3 |
| 7 | 6 | 1 | 9 | 3 | 8 | 5 | 2 | 4 |
| 3 | 5 | 4 | 1 | 7 | 2 | 6 | 8 | 9 |
| 4 | 1 | 7 | 2 | 6 | 3 | 8 | 9 | 5 |
| 2 | 9 | 5 | 4 | 8 | 1 | 7 | 3 | 6 |
| 8 | 3 | 6 | 5 | 9 | 7 | 2 | 4 | 1 |
| 1 | 7 | 8 | 3 | 5 | 4 | 9 | 6 | 2 |
| 5 | 4 | 9 | 7 | 2 | 6 | 3 | 1 | 8 |
| 6 | 2 | 3 | 8 | 1 | 9 | 4 | 5 | 7 |

Sudoku:Pirs 11

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | 9 | | | | 8 |
| 9 | 4 | | | | 1 | | | |
| | | 6 | | 3 | | | 9 | 5 |
| | | 9 | | 1 | | 8 | | 7 |
| | 1 | | 4 | | 6 | | 2 | |
| 6 | | 3 | | 7 | | 4 | | |
| 5 | 7 | | | 2 | | 9 | | |
| | | | 7 | | | | 1 | 2 |
| 1 | | | | 8 | | | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Mala wî li ser pişta dîk e û dîk di bin de fîkefîk e:**
-Bi heman wateyê.
**Mal xizan e kevanî/kebanî nezan e:**
- Dema tiştekî mirov tinebe mirov nezan tê dîtin.
**Mala xwe daniye ser pişta pisîkê:**
- Mirovekî pir xizan e; tiştekî wî nîne.
**Mala xwe li pisîkê kiriye:**
- Bi heman wateyê.
**Mişk li dikana wî bigere wê poçika wî bê xuyan:**
- Bi heman wateyê.
**Ne ser wî ne bin wî:**
- Rût e; tiştekî wî nîne.
**Ne terrik e ne berrik e:**
- Tiştekî wî nîne; bêxwedî ye; pir xizan e.
**Terrik: Berrika piçûk, cila ji bo rûnştinê:**
Neynok nînin xwe pê bixwerîne/neynok nemane xwe pê bixwerîne:
- Xizan e; belengaz e.
**Para geroka çû ber bablîsoka:**
- Kesê xizan para wî nîne; ti kes qîmetê xizanan nizane.
**Rojên eydan zikê feqîran diêşe:**
- Pir dixwin.
**Spiyan çavên wî xwarine:**
- Pir xizan e; belengaz e.
**Şûjinê dialîse:**
- Pir xizan e; di mala wî de tiştek nîne.
**Teqeteq ji qirikê tê:**
- Bi heman wateyê.
**Tiştek di destê wî de nîne:**
- Bi heman wateyê.
**Tu tayekî ji kirasê wî bikişînî wê sed reqepîne jê bikevin:**
- Bi heman wateyê.
**Weke maran bi axê didebire:**
- Rewşa wî ya aborî pir xirab e; tiştek nîne bixwe.
**Xizaniyê çavê wî xwariye:**
- Pir xizan e.
**Yê li ber deriyan e:**
- Bêkes e; tiştekî wî nîne.
**Yên mala wan piçûk li pisîkê dikin:**
- Kesên xizan, yên hindik cihekî piçûk jî têra wan dike, pêwîst nake amadekariya mezin bikin.
-Tiştek di mala wî de nîne; dûvê mişk di mala wî de ard nagire; rewşa wî ya aborî pir xirab e.
**Zarokên wî binê piyê hev dialîsin:**
- Bi heman wateyê.
**Zikekî têr diwazdehê birçî:**
- Geh têr geh birçî.

**LI SER HEVALTIYA XWEŞ Û NEXWEŞ**

**Agir û pîşo/pîso ne:**
- Du kes, yan du tiştên dijberên hev bi hev re nabin.
**Agir û pîşo/pîso li cem hev nabin:**
- Bi heman wateyê.
**Asinê wan ji hev nagire:**
- Bi heman wateyê.
**Bi hev ve dan:**
- Hevaltiya xwe xirab kirin; hev êşandin; bi hev re nebirin serî.
**Di kirasê hev de ne:**
- Weke hev in; bi serê hev dixin; hevaltiya wan xweş e.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1099 | 13-Îlon- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# OPERASYONA 'XURTKIRINA EWLEHIYÊ' PLANÊN LI HEMBERÎ HEREMÊ TÊKBIRIN

Cîgira hevseroketiya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Emîne Osê destnîşan kir ku operasyona 'Xurtkirina Ewlehiyê' gelek planên mezin ên li dijî herêma bakur û rojhilatê Sûriyê têk birin.**R-4**





## Li kampên Şehbayê jin amedekariyên zivistanê dikin



Jinên Efrînî yên ku li herêma Şehbayê jiyan dikin, bi nêzîkbûna demsala zifistanê dest bi amedekariyên hişk kirina xwarinên zivistanê kirine. Ev yek weke çandeke demdirêj di nava civaka Kurd de tê nas kirin.**R-6**

## Hezkiriyê welat koça dawî kir

Hunermendê Kurd yê navdar Beytocan ku demeke dirêj li Swêdê ji ber nexweşiya kanserê dihate dermankirin, jiyana xwe ji dest da.**R-3**




## Rojda Têkoşîn: Li Rojava hezkirin, hêvî û têkoşîneke mezin heye

Jina Berazîlî Rojda Têkoşîn ku ji sala 2022'an de berê xwe dabû Rojava û di nava xebatên çandê de cihê xwe digre, diyar kir ku li Rojava rastiya jiyan, têkoşîn û azadiyê heye û got, di şoreşa Rojava de hezkirin, hêvî û jiyana rast heye.**R-7**




## Tecrîd binpêkirina tevahî zagonên navneteweyî ye



Hevseroka Yekitiya Parêzeran a Herêma Cizîrê Nisrîn Osman diyar kir ku tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan tê meşandin li dijî tevahî qanûnên navneteweyî ye, û destnîşan kir ku ew ê heta azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêkwere têkoşînê dewam bikin.**R-5**

## Sûcên li dijî jinên kurd li Efrînê berdewam in



Kiryarên dagirkeriyê li herêmên dagirkirî bê navber didomin, bi taybet derheqê jinan de sûcên dijmirovî tên kirin. Endama Kordînasyona Kongra Star a Efrîn û Şehbayê Rîhan Elî da zanîn ku li Efrînê herî zêde destdirêjî li ser jinên Kurd tê kirin û li hemberî vê yekê jî tevahiya rêxistin û destgehên navneteweyî bêdeng in.**R-2**



Nehîr pale
**Jin dikare bibe hêza çareseriyê** *R-2*



Farûk Sakik
**Cûntaya12'ê Îlonê** *R-5*

# Sûcên li dijî jinên kurd li Efrînê berdewam in

Kiryarên dagirkeriyê li herêmên dagirkirî bê navber didomin, bi taybet derheqê jinan de sûcên dijmirovî tên kirin. Endama Kordînasyona Kongra Star a Efrîn û Şehbayê Rîhan Elî da zanîn ku li Efrînê herî zêde destdirêjî li ser jinên Kurd tê kirin û li hemberî vê yekê jî tevahiya rêxistin û destgehên navneteweyî bêdeng in.

**Vîndar Roj/ Şehba**

Sûcên dagirkeriya Tirkiye û çeteyên girêdayî wê yên ku li ser gelên Kurd didin meşandin, sûcên dij mirovî ne û tavahî pîvanên exlaqî derbas dikin. Ji destpêka dagirkirina bajarê Efrînê di dîroka 18'ê Adara 2018 an de tu destdirêjî li ser sererd û binerda herêmê nema û nehatiye kirin. Ji talankirina xwezayê bigire heyanî kûştin û revandina jin û zarokan. Komên çeteyan û artêşa Tirk ya dagirker bi van sûc û zextên ku dikin gelê resen ji cewherê wan yê kurdewariyê derxînin û dagirkeiya xwe rawa bikin. Di van demên dawiyê de faşîzma Tirkiyê bi taybet li ser mijara sîstema xwendinê ya Tirkiyê dixebite da ku ji aliyê hişmendî ve serweriya xwe misoger bike. Bi tayebet kiryarên dagirkeriyê li ser jinên Kurd bi giranî tên pêkanîn. Di van mijaran de her çiqasî di aliyê belgekirina van kiryaran ji raya giştî re, lê belê bê bersiv mane. Di van siyaset û bêexlaqiya ku li ser jinan tên pêkanîn de divê bi giranî dagirkerî bê teşhîr kirin û bê dengî neyê qebûl kirin. Têkildarî kiryarên ku di derheqê jinan de tên pêkanîn Endamê Kordînasyona Kongira Star a Efrîn û Şehbayê Rîhan Elî ji rojnameya me re axivî.



**'Di Efrînê de siyaseta asîmîlasyon û qirkirinê tê meşandin'**

Rîhan di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser destdirêjiyên herî dawî di Efrînê de tên pêk anîn û wiha got:"Zêdetirî 5 sala ye dagirkeriya Tirkiyê û komên çete yên di Efrînê de hemû rengên Talankirin, kûştin, revandin, testdirêjî û tecawîzkirinê didin meşandin. Ev yek weke gotin em tînin ser ziman belkî pir hêsan be, lê belê însanên ku di van kiryaran re derbas dibin, ji hemû çareseriyan bê par in û bi heqîqeta heyî re dimeşin. Di bin hovîtiya dagirkeriyê de neçarin jiyan bikin. Di van demên dawiyê de hîn bêtir ev kiryar berfirehtir dibin, êdî derbasî asta revandina û tecawîz kirin zarokan. Ji milekî din ve jî ya herî xeternak guhertina demugrafîk a ku dagirkeriya tirk li heremên dagirkirî dide meşandin û di serî de li Efrînê ev yekê tê meşandin. Ev yek jî bi destek û hevkariya dewlet û komeleyên weke Qatarî, Kiwêtî û Fîlistînî li Efrînê tê meşandin. Ev yek dikeve çarçoveya qirkirina çandî û hişmendî ya ku bi taybet li ser gelê kurd û li Efrînê tê meşandin.

**'Hovîtiya dagirkerên tirk sînoran nas nake'**

Rîhan da xuya kirin ku piştî dagirkirina Efrînê gel mecbûr dimîne jinên temen biçûk bizewicîne û wiha domand: "Me destnîşan kiribû ku di demên dawiyê de komên çete dest davêjin zarokên temen biçûk, weke ku di çend bûyerên dawiyê de hatiye dîtin û di encam de jin rastî hemû kiryarên dij mirovî tê û li beramberî vê yekê jî tu saziyên navnetewî dengê xwe nakin. Ji ber van sedeman gelên herêmê ji neçarî û ji bona ku destdirêjî li keçên wan ji milê komên çete ve neyê kirin wan dizewicînin. Ev diyardeyên ku em dibînin gelek bi êşin û weke destdirêjî li mafê zarokatiyê tê dîtin".

**'Saziyên navnetewî bêdeng in'**

Rîhan di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku tavahî sûc û kiryarên li ser jinan tên kirin ew belge dikin, lê bê encam dimînin û wiha got: "Di xebatên me de weke komîteya Enfermasyon û belgekirinê heye. Ev komîte li ser belgekirina kiryarên ku di derheqê jin û zarokan de tên kirin dixebite. Tavahî sûcên ku hatine kirin bi awayekî berfireh çi bi riya jêderên di hundir Efrînê de dibe û çi jî bi riya kesên ku berê xwe didin herêmê hatine belgekirin û ji aliyên têkildar re hatine şandin. Lê belê ruxmî viya jî dewlet û rêxistinên têkildar bê bersiv û bertek dimînin".

**Sûcên dagirkerên tikr di derbarê jinê di sala 2023 an**

Li gorî Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Sûriye kiryar û destdirêjiyên ku ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê û komên çeteyan ve di sala 2023 an li ser jin di Efrînê de hatine kirin wiha ne. 30 jin hatine revandin, 3 jin hatine kuştin û 2 jin jî hatine tecawizkirin. Herwiha ji destpêka dagirkirina bajarê Efrînê ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê ve. Zêdetirî 1000 jin hatine revandin. 99 jin hatine kuştin ji wan 8 jinan xwe kuştine. Herwiha 74 jin jî hatine tecawiz kirin.

# Dayîkên Efrînî tevî zehmetiyên koçberiyê jî dest ji karê xwe bernadin

**Zana Roj/ Şehba**

**Dayîkên Efrînî yên ku ji axa xwe derketine bi hêviya vegera ser axa welatê xwe dest ji kar û jiyanê bernedan. Yek ji wan dayîkên kedkar jina Efrînî ya bi navê Wîded Rifet e ku zêdetirî 43 salan karê dirûnê dike û bi xebatê dirûnê niha li herêma Şehbayê debara jiyana xwe û malbata xwe dike.**

Dayîkên Kurd yên kedkar her dem di oxira malbat, civak û jiyanê de temenê xwe feda kirine. Bi zîrekbûn û jêhatîbûna xwe barê jiyanê hildana ser milên xwe. Di rêûresmên rûyê wan de hemû ked û êşa jiyanê tê xuyakirin, li ber lorandina zarokan re çanda xwe ya resen bi tiliyên wan yên pîroz dihat hunandin.
Yek ji wan dayîkên kedkar jina Efrînî ya bi navê Wîdad Rifet e, ku ji gundê Xwazyanê yê girêdayî navçeya Mabata ye. Dayîka Wîdad bi temenê xwe yê 55 salî zêdetirî 43 salan e karê dirûnê dike.

**'Ji hezkirinê bi tena xwe fêrî karê dirûnê bûm'**



Dayîka wîdad di vegotina serpêhatiya xwe de ev anî ziman: "Dema temenê min 15 salî bû meraqa min li ser karê dirûnê çêbû, lê belê makîneya min ya dirûtinê nîn bû, min li ser bavê xwe îsrar kir ku ji min re makîneyekê bîne. Di wan deman de makîneyên ku bi destan dihatin xebitandin hebûn. Bavê min ji min re bi 200 leyreyî Sûrî kirî. Ji meraq û hezkirina min ya zêde bêyî ku ez biçim ber destê osteyekî ez di mal de fêrî karê terzî bûm. Niha ev bûye 43 sal ez karê dirûnê dikim."
Dayîka wîded anî ziman ku piştî 20 saliya xwe ew derbasî mala hevjînê xwe bû, lê dest ji hezkirina xwe ya kar berneda û wiha got: "Dema ez nû fêrî kar dibûm, li ser cil û bergên birayên xwe ez fêr dibûm û bi vî awayî min gavên yekemîn avêtin. Di 20 saliya min de ez derbasî mala hevjînê xwe bûm û em hatin bajarê Efrînê. Êdî min her kesî re got ku ez terzî me. Jinên taxê dihatin gel min û hêdî hêdî bi piratîkê karê min dengveda. Min gelek jinênên ciwan yên derdor fêrî vî karî kirin. Di Efrînê de ez gelek bi nav û deng bûm, dema min çênedibû êdî ez li karê malê binêrim. Lê rûxmî wê jî min dest ji karê xwe berneda û min roj bi roj bi xwe re mezin kir."

**'Çanda jinên Efrînê kirasê Kurmancî ne'**

Yadê Wîdad di axaftina xwe de destnîşan kir ku beriya her tiştî ew fêrî dirûtina kirasên kurmancî yên ku çanda jinên Efrînê temsîl dike, bû û wiha axaftina xwe domand: "Yek ji cilên ku çanda Efrînê temsîl dike, kirasên Kurmancî yên taybet jinên herêma Efrînê pê tên naskirine. Di destpêkê de yekemîn kiras min ji xwe û dayîka xwe re çêkir. Çanda me ya resen yek jê ew kirasin, weke ku tê zanîn piraniya jinên Efrînî wan kirasan li xwe dikin, ji ber wê min gelek meraq dikir ku ez jî bikaribim vê yekê çêbikim. Bi vê yekê min bi karê xwe alîkariya malbata xwe û dabara jiyana xwe dikir."

**Tevî zehmetiyên koçberiyêjî, dest ji karê xwe berneda**

Efrîn ji bo gelê EFrînî weke bihuştê bû û gelê wê hêviyên xwe tê de mezin dikirin. Bi dagirkirina Efrînê re, di 18 ê Adara 2018'an de, ew hêviyên ku dayîk û bavan, zarok û ciwanan ji xwe re mezin dikirin bi destê dagirkeriyê hatin hilweşandin. Dayîka Wîdad derabarê karê xwe yê piştî koçberiya ji Efrînê wiha got: "Piştî em koçberî herêma Şehbayê bûn, weke hemû gelê koçber em rastî zehmetiyên jiyanî û piskeolojî hatin. Lê belê min dît ku bi vî awayî jiyan derbas nabe. Min makîneya xwe ya heyî ji bermahiyên malên ku hatine rûxandin kom kir û çêkir. Li navçeya Til qirah min terzîgehek vekir û tê de dest bi karê xwe kir. Ev bû şeş salin ez li ser vê makînê dixebitim. Û her roj li ber derziya dirûnê ez xeyal û hêviyên roja pîroz ya vegera Efrînê jiyan dikim."

## Ji Pênûsa Jin

### Jin dikare bibe hêza çareseriyê

**Nehîr Pale**

Çareserî ne tiştekî hesane, di nava civakê de her tim kesên weke pêxember, feylesûf û şoreşger li çareseriyê geriyane û berpirsyartiya wê rakirin e. Em li ser hevdû dibihîzin ku buyer qewimîne û ev buyer dibin sedema ku em jan bikşînin û tirsek bi me re çêbibe. Eger jinek were kuştin an xwe bikuje bandor li me dike û em bê çare dimîn in. Gelek lawaziyên me hene ku di encama wê de dibe ku pirsgirêk derbikevin. Çima em fêr nabin tedbîrên xwe bigrin berî ku buyer biqewimê. Çareseriya herî baş jî ew e ku em xwe bugherîn in.
Niha ji %30 jin berê xwe dane bikar anîna madeyên hişbir. Hinek ji wan bi riya xort û hevjînên xwe dikevin xefkê û fêr dibin, hinek jî di bin navê hevaltiyê de û çav li hevalên xwe dikin dest pê dikin. Hejmareke mezin ji bo jibîrbikina madeyên hişbir çareserî dibînin. Şert û mercên tê re derbas dibin ji xwe re dikin derd û bi riya madeyên hişbir hema kêmekî be jî hewl didin derdên xwe jibîr bikin. Derdê wan çi ne? Di nava civakê de şert û mercên şer heyanî astekî ji xwe re dikin derd û bi kolanan dikevin. Lê belê rojekê li xwe venegeriyane û negotine dibe ku pirsgirêk ji zîhniyeta me be yan jî em parçeyekî ji pirsgirêkê ne. Ji bo para xwe di buyerê de nebînin bar tavêjin ser derdora xwe û li çareseriyê nagerin û ne jî berpirsyartiya wê radikin. Eger em gazinc ji rewşa şer dikin, şer wê her berdewam bike, çima em fêr nabin ku li gorî hemû şert û mercan xwe birêxistin bikin û destûr nedin ku tiştek bandor li ser jiyana me bike. Jiyana xwe ji hemû tiştên ziyan bidiyê, biparêzin. Rêber APO di bin tecrîdeke gelekî giran de ye û rojekê jî gav paşve ne avêtiye, yek ji lêgervanên çareseriyê ye, kî pê re bijî yan li ser fikrê Rêbertî bijî tucarî lewaz nabe û nakeve xefka lawaziyên xwe, ew ê her tim li beramberî şert û mercan xwedî tedbîr be. Lêgervanê çareseriyê Rêber APO ji gelek aliyan ve pirsgirêkan analîz dike sedemên qewmandina buyeran şîrove dike û rêbazên çareseriyê dibîne. Rêbertî xwe parçeyek ji civakê dibîne, buyeran dûrî kesayeta xwe tehlîl nake û di guhertinê de ji xwe dest pê dike. Em weke jin dema ku dikevin xefka lewaziyên xwe û dest bi madeyên hişbir dikin, pirsgirêk a me ye, nabe ku em gaznca kesî bikin û berpirsyartiya xwe bavêjin ser derdora xwe. Civaka cinsiyetparêz tu carî bi azadiya jinê re mijûl nabe, ji bo wê hebûn û tinebûna jinê ne girîng e, em ê çima hêvî jê bikin û li bendê bin ku pirsgirêkên me çareser bikin an jî ziyanê bighînin jiyana xwe. Lêger û berpirsyartiya çareseriyê rakirin wê hêzeke mezin bide me. Êdî li beramberî guhertina şert û mercan em ê bikarbin li ber xwe bidin û jiyana xwe biparêzin. Em ê ne tenê ji xwe re çarseriyê deynin em ê ji tevayî jinên cîhanê re bibin çareserî.



# Rojda Têkoşîn: Li Rojava hezkirin, hêvî û têkoşîneke mezin heye

Jina Berazîlî Rojda Têkoşîn ku ji sala 2022'an de berê xwe dabû Rojava û di nava xebatên çandê de cihê xwe digre, diyar kir ku li Rojava rastiya jiyan, têkoşîn û azadiyê heye û got, di şoreşa Rojava de hezkirin, hêvî û jiyana rast heye.

**Mihemed Xanim/ Qamişlo**

Şoreşa Rojava ku di 19'ê Tîrmeha 2012'an de bi pêşengiya jinan hat destpêkirin, li tevahiya cîhanê deng veda û bala hezkerên azadî û demokrasiyê yên cîhanê kişand. Li ser wê bingehê, ji bo naskirina azadiyê û fikrê neteweya Demokratîk, herwiha beşdarbûna nava refê şoreşa gelan, bi 100'an ciwanên û kesên enternasyonal ji tevahiya welatên cîhanê berê xwe dan Rojava, herwiha tevlî nava hemû qadên şoreşê yên leşkerî, civakî û çandî bûn. Di heman çarçoveyê de bi 10'an ji wan ciwanan ji bo parastina xaka Rojava şehîd û birîndar bûn.
Yek ji jinên internasyonal ku ji bo naskirina Şoreş di sala 2022'an berê xwe dayê Rojava û di nava xbatên çandî de cihê xwe girtiye, jina Berazîlî Rojda Têkoşîn e. Rojda di sala 1983'an li bajarê Sawpawlo yê Berazîliya ji dayîk bûye û kar û xebatên Şanoyê dike.
Jina Berazîlî Rojda Têkoşîn derbarê Şoreşa Rojava û kar û xebatên xwe yên li Rojava ji rojnameya me re axivî.
Rojda diyar kir wê ji zaroktiya xwe ve ji şano û dansê hez kiriye û tevlî xebatên şanoyê bûye, herwiha ev demeke dirêje ku ew wekî mamosteya şano û dansê kar û xebatê dike.
Rojda da zanîn ku wê yekem car di sala 2017'an de bi riya nivîsekê Rojavayê Kurdistanê nas kir û wiha got: "Di sala 2017'an min nivîsek li ser şoreşa Rojava xwend, tê de behsa têkoşîna gel û jinan li hemberî DAIŞ dihat kirin, vê yekê pir bala min



dikşand. Ji bo naskirina bingeha vê şoreşê min pirtûkên Rêber Abdullah Ocalan xwendin, di pirtûkên Rêber Abdullah Ocalan de jî tişta ku herî zêde bandor li firkên min kir, azadiya jin û konfedralîzma demokrat bû. Herwiha piştî ku min pirtûkên Rêber Abdullah Ocalan xwendin, min pirsgirêka jinan li Berazîlya jî nas kir."

**'Bi fikrê Rêber Apo min wateya azadiyê nas kir'**

Rojda da xuyakirin ku li Berazîliya jin wekî koleyê desthilatdariyê kar dikin û wiha domand: "Li Berazîlya min kar dikr, min dixwest bi riya hunerê hinek guhertinê çêbikim, lê min nikarîbû, er ê li wir jin kar dikin, lê li gorî hişmendiya mêr kar dikin û nikarin xwe ji vê hişmendiyê rizgar bikin. Ev rastiya ku min nas kir jî, bi xwendina pirtûkên Rêber Apo pêk hat. Beriya ku ez pirtûkê Rêber Apo bixwînim, min digot ez azadim, ez çi bixwazim dikarim bikim, lê piştî min fikrê Rêber Apo nas kir, min fam kir ku rêbazê me şaş e, erê em kar dikin lê em ne azadin, ez kole ne, koleya sîstemê û desthildariyê ne."

**'Li Rojava çand bingeha civakê ye'**

Rojda da xuyakirin ku wê ji bo naskirina cewherê azadiyê berê xwe da Rojava û wiha domand: "Di sala 2022'an de ez hatim Rojava, min nizanîbû bi kurdî yan Ingilîzî biaxivim, tenê ez bi zimanê Ispanî û Portogalî diaxivîm. Destpêkê min di ziman de hinek astengî kişandin, lê piştî wê ez hinekî ferî ziman bûm, tevî nebûna ziman jî, lê min Atmosfêr fam kir, min ked û heskirina li Rojava fam kir. Piştî ez li vir mam min karî ez rastiya Rojava fam bikim, piştî wê min di xebatên çandî de cihê xwe girt. Min karîbû ez nasbikim rêbazê çand çawaye. Mînak, li vir karê çandê bi hevbeşî û rêbazekî demokratîk pêş dikeve, lê li Berazîlya ne wisa bû, li wir kesî berpirsyar wî her tişt feriz dikr. Li Rojava mirov dide û digre, ev li cem min tiştekî nû bû, tevî ku zimanê me ne hevpare, asoya hevfêrkirin heye. Ev yek ji bû min girîng bû. Li Rojava çand jî perçeyek ji şoreşê ye, perçeyê têkoşînê ye, lê li Berazîliya ne wisa bû. Li bajarê Sawpawlo ku ez lê ji dayîk bûm e, 20 melyon kes dijî, lê ne civak û nerx tune ye, erê li wir min karê xwe yê hunerî dikr, lê em ji civakê dûrin, lê li Rojava çand bigeha civakê ye, min li vir fam kir girîngiya çandê ji bo civakê."

**'Tevî zehmetiyan jî, hezkirin, hevî û têkoşîn heye'**

Rojda balkişand ser filkilora Rojava û wiha got: " Min ji filklorê li Rojava pir hez kir, li vir mirov hîz dik ku bi axa xwe ve girêdayî ye, mirov dibîne , têkilyê bi civakê re çêdike, vê yekê bala min kişand, li Rojava hezkirin û hêvî heye. Piştî ku ez careke din vegeriyam Berazîliya, tevî ku min li wir jiyana xwe derbas kiriye û koka mine, lê min hêz kir ku tiştek ji min kêm e, min pir bêriya Rojava kir, ji ber li Rojava mirov jiyane rast jiyan dike, lê li Berazîliya ne wisa ye, mirov rastî û şaşitiye ji hev nas nake, herdem ji aliyê sîstemê ve tê xapandin. Ji ber wê ez careke din hatim Rojava, li vir mirov xwedî potansiyala pozîtîve, li vir erê pirsgirêk hene, lê têkoşîn jî heye, mirov têkoşînê dike û xwedî hêvî ye, asoyên hêviyan xuya ye."

**'Bingeha azadiya jin guhertina zihniyetê ye'**

Rojda Têkoşîn da zanîn ku sîstemên desthilatdar ji hêza jinê ditirse û wiha domand: "Sîstema desthilatdar naxwazin ku jin yekîtiya xwe ava bikin û bibin hêz, ew ji hêza jinan ditirsin. Pirsgirêka herî mezin ku jin ji sîstemê bawer dike. Ji bo ku planên desthilatiyê têk biçin, pêwîstî bi têkoşîn û rexistibûyîneke mezin heye, jin bi yekîtî û rêxistibûyîna xwe dikarin dibin hêzke mezin , mînaka şoreşa Rojava jî li ber çava ye. Li Rojava jinan gelek destkeftî di tevahiya aliyan de bi dest xistin, di hemû qadan de bû pêşeng, li hemberî sîstema baviksalariyê têkoşînê dimeşînin. Divê jin xwe bi xwe rêxistin bikin û zihniyeta xwe bigherin, bê guhertina zihniyetê jin nikare tu gavan biavêje."

**'Emê xeyalên şehîdan pêk bînin'**

Rojda derbarê ciwanên ku berê xwe didin koçberiya li Ewropayê wiha got: "Sîstem bi riya tevahiya destgeh û toreyên civakî yên girêdayî wê, xwe wekî çareserî derdixîne holê, ciwan jî dikevin xefka sîstemên desthilatdar de, berê xwe dide welatên din û dibe kole, lê ew ne di wê ferqê de ye. Tişta ku min xemgîn dike çawa ciwan ji şoreş û azadiyê berê xwe didin koletiya li Ewropa û li wir di nava koletiyê dimînin. Li Rojava ez xwe azad hêz dikim, ji ber ku mirov li vir azad jiyan dike û bi alternatêfên xwe xwe pêşt dixe. Li ser vê xakê gelek şehîd hatin dayîn, ciwanên enternasyonal jî, ji bo azadiyê berê xwe dan Rojava û tevlî nava şoreşê bûn, herwiha gelek şehîd ketin, devî em xeyalên van şehîdan pêk bînin."

# 'Zarok keziyên hûnandî yên azadiyê ne'

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Rêvebera Kordînasyona Tevgera Hîlala Zêrîn Mizgîn Çolax diyar kir ku çand nasnameya gelan e û got, zarok keziyên hûnandî yên azadiyê ne, wê zarok û ciwanên me bi riya çand û hunerê çanda dayika xwedewend biparêzin û zindî bikin.**

Bi Şoreşa Rojava re, gelên bakur û rojhilatê Sûriyê bi berhemên dîrokî û çandî careke din dîroka xwe zindî dikin. Bi şoreşê re gelek tişt bi dest ketin û gelên ku xwedî dîrok bûn dikaribûn van destkeftiyan bi şoreşê re vegerînin û nasnameya xwe qezenc bikin. Gelên herêmê bi hemû pêkhateyên xwe dikaribûn careke din çand, huner û nasnameya xwe bi kar û xebatên xwe re vegerînin. Yek ji tevgerên çandê yên jinan yên bakur û rojhilatê Sûriyê ku bi şoreşa Rojava re gelek destkeftî ji bo jinan bi dest xistiye, Hîlala Zîrîne. Îro Hîlala Zêrîn nasnameya çanda jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye ku li gelek deran rêxistinbûna xwe ava kiriye û bi beşên hunerê dikaribû jinan vegerîne çanda jinên xwedawend. Wê bi gelek beşên xwe mohra xwe li dîrokê dide.

**Avabûna Hîlala Zêrîn**

Tevgera Hîlal Zêrîn di sala 2015'an de li çiyayên Kurdistanê hatiye avakirin, di 2016'an de li herêma Cizîrê, di 2017'an de li herêma Efrînê û di 2018'an de li Kantona Kobanê hatiye avakirin. Her ku şoreş mezin bû, Hîlala Zêrîn jî xwe berfireh kir û li tevahî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwe bi rêxistin kir. Niha li tevahî herêm û Kantonên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi awayekî fermî navendên Hîlala Zêrîn hene û di wan navendan de bi dehan kar û xebat tên kirin. Jin di qadên hunerî de bûne xwedî tecrube û gelek ji wan jinan û zarok niha cihên xwe di nava govend, koma muzîk, şano, çîrok, helbest, wênexêzî, dengbêjî, pargîn û nivîskariyê de digrin.
Li aliyekî din jî ji bo pêşxistina çand û hunerî li cem zarokan, li bakur û rojhilatê Sûriyê gelek kar û xebat tên meşandin, bi awayekî berfireh, pêşbir, çalakî û festîval ji bo wan tên li darxistin.
Di wê çarçoveyê de, di 2 Mijdarê de, 8`emîn festîvala Hunera Zarokan a li ser asta bakur û rojhilatê Suriyê bi dirûşma "Zarok keziyên hûnandî yên azadiyê ne" li navenda Çand û Hunerê ya Aram Tîgran a bajarokê Rimêlanê dest pê kiribû. Festîvala bi armanca vejandina çand, huner û kevneşopiya pêkhateyên Kurd, Ereb û Suryan hat li darxistin.
Di derbarê pêşxistina çand û hunera zarokên bakur û rojhilatê Sûriyê Rêveberiya Kordînasyona Tevgera Hîlala Zêrîn Mizgîn Çolax ji rojnemeye me re axivî.

**'Bi riya çand û hunerê histên zarokan derdixin holê'**

Mizgîn diyar kir ku festîvalên zarokan her sal li ser asta bakur û rojhilatê Suriyê tên lidarxistin û wiha domand:



"Festîval îsal cûda ye, bi tevlêbûna tevahî pêkhateyên kantona Qamişlo; Kurd, Ereb û Suryan vestîval hat lidar xistin. Zarokên me di vê festîval de dixwazin çanda rasteqîn a herêmê û jiyana hevbeş bidin xuyakirin. Her sal 1`ê miha Îlonê bi pêşengtiya Hîlala Zêrîn û Tev Çan festîvala zarokan li ser asta bkur û rojhilatê Suriyê, herwiha li hemû herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê tê li dar xistin. Di festîvalê de tenê zarok pêşdar dibin, li ser dirêjiya salê pirovayê xwe dikin, wekî kovend, stran, şano, wêne û lêdana amûrên mûzîkê. Em dixwazin bi riya çand û hunerê histên zarokan derbixin holê. Festîvala zaroka li kantona Qamişlo, li bajarê Rimêlan ji 1 heya 3`yê Îlonê hat lidarxistin û ji hemû bajaran tevlîbûn çêbû. Di heman demê de li kantona Hesekê û Kobanê jî hat li darxistin. Li herêmên rizgarkirî wekî Tepqa, Reqa û minbicê jî festîvala zarokan beriya wê hatibû li darxistin. Festîval wê li Helebê di 28`ê Îlonê, li Şehab jî di miha Cotmehê de werin li darxistin."

**'Em çanda dayika xwedawend zindî dikin'**

Rêveberiya Kordînasyona Tevgera Hîlala Zêrîn Mizgîn Çolax di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Armanca me ew e ku zarok bi riya çand û hûnerê civaka xwe bidin nasîn û çandê zindî bikin. Çanda dayîkê mîna dayîka xwedawende ku berî 5000 hezar sal ked û xebat kiriye. Li ser vê bingihê em dixwazin çand û hunerê bi riya ciwanan û zarokan biparêzin, ji ber ku çand nasnameya me ye."

# Li kampên Şehbayê jin amedekariyên zivistanê dikin

Jinên Efrînî yên ku li herêma Şehbayê jiyan dikin, bi nêzîkbûna demsala zifistanê dest bi amedekariyên hişk kirina xwarinên zivistanê kirine. Ev yek weke çandeke demdirêj di nava civaka Kurd de tê nas kirin.

**Navenda nûçeyan**

Di demsala havînê de jinên Kurd hazirtiyên xwe yên ji bo zivistanê dikin. Di demsala zivistanê de xwarinên taybet yên ku tên hişk kirin û kelandin û weke munet tê rakirin hene. Ev weke çandeke ji dîrokê heyanî roja îro xwe diparêze.
Ji van amdekariyan re jinên Efrînê yên koçber jî niha weke ku dema li Efrîna muneta xwe ya salê radikirin, li Şehbayê jî amedekariyê dikin.
Jinên Efrînê li Efrîn ji çêkirina dimsê îsotan û bacanê Sor, hişkirina bacanên reş, kondir, bamî, kelandina genim, her curek ji xwarinên zivistanê di malên Efrîniyan de hebû. Lê belê niha li kampên koçberiyê welatî nikarin her pêwîstiyên xwe peyda bikin. Ji ber ku herêma Şehba ji milê hikumeta şamê ve di nava dorpêçêdeye û gel nikare bi hesanî pêdiviyên xwe peydabike.
Koçberên Efrînê bi çandina baxçeyên bikûç li ber deriyên çadirên xwe di kampan de, debara xwe tînin û mûna xwe ya zivistanî jî jê çêdikin. Amedekariya îsal a zivistanê ya herî zêde dimsa îsotan e. Girêdayî amedekariyên demsala zivistanê jinên koçberên Efrîn nêrînên xwe bi me re parve kirin.



Fatmnê Cuma

## ‘Em bi keda destê xwe mûna xwe ya demsala zivistanê hazir dikin’

Fatmnê Cuma wiha behsa amadekariyên xwe yên ji bo zivistanê ya li Efrînê kir: “Me her sal amedekariya xwe ya zivistanê dikir. Em Sibihê diçûn nav baxçan, me bacan, îsot û bamya komdikir û me ji bo zivistanê amedekariya xwe dikir. Me bi kêfxweşî di zivistanê de xwarinên ku me çêdikirin dixwar. Ji ber ku ev yek weke çandeke me bû.”
Fatmê diyar kir ku piştî ku koçber bûn nexwest çanda ku li ser mezinbûne winda bikin, lê nikarin hemû amedekariyan jî bikin û got:” Em 6 salan di hundir kampan de jiyan dikin, lê em di hundir kampan de di vê demê de amedekariya xwe ya zivistanê dikin. Ji wan amedekariyan a îsal ya herî zêde dimsa îsotan e. Ji ber dorpêça heyî em nikarin hemî pêdiviyên jiyanê peyda bikin.”



Emel Mihemed

Fatmê di dawiya axaftina xwe de wiha anî ziman û got:”Em niha tenê dixwazin vegerin mala xwe. Em ked didin li vir da ku em çanda demdirêj a ku di nava me de belav bûyî neyê ji bîrkirin diparêzin.”









## “Em hemû pêdiviyên xwe bi destê xwe amede dikin”

Emel Mihemed ya ku li kampa Serdem jiyan dike anî ziman ku rûxmî pêşketina derfetên jiyanê, lê ew fêrî çêkirina muneta salê ya destê xwe bûne û wiha domad: “Di van salên dawiyê de jiyan di her alî de hêsantir bûye. Êdî piraniya jinan kelûpel û xwarinên zivistanê yên amedekirî esas digrin. Lê em fêrî vê yekê nebûne, malbatên Efrînî ji kevin de van hazirtiyan her sal bi destên xwe çêdikin û ji demsala zivistanê re radikin”.

## ‘Em dimsê îsotan amede dikin’

Emel ya ku dimsa îsotan çêdike û li Efrînê jî her sala wek vê demê amedekariyên zivistanê dikin û wiha pêde çû: “Her sala di vê demê de em amedekeriya xwe ya zivbistanê dikin. Ji amedekirina her cureyekî ji çêkirina dimsê îsotan bigire û her tişt me bi destê xwe çêdikir û me tu carî amedekariya zivistanê ji bazarê nedikrî. Lê belê ji 2018 an ve û ji dema ku em hatin Şehbayê û buhabûna heyî û dorpêça li ser herêma Şehbayê hatiye ferz kirin. Em amedekariya zivistanê dikin,lê ne bi dilê me ye. Em niha dimsa îsotan bi destê xwe çêdikin”.
Di dawî de Emel anî ziman ku, ew hêvî dike ku dema vegere Efrînê ji nû ve hemû moneya zivistanê careke din bi hezkirin û di xaniyên xwe de amede bikin”.

# ‘Perwerde bingeha pêşxistina mamosteyan e’

**Ayşa Silêman/Qamişlo**

**Mamosteyên Bexçeyên Zarokan yên herêma Cizîrê salane tevlî perwerdeyên biranşan dibin, îsal jî perwede bi vekirina sê navendan destpê kir û 176 mamoste tevlî perwerdeyê bûn.**

Ji destpêka avakirina Bexceyên Zarokan yên girêdayê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya herêma Cizîrê, ji bo pêşxistina asta mamosteyan ya zanistî û rêbazên wanedayîne, salane beriya vekirina bexçeyên zarokan mamoste tevlî perwerdeyan dibin.
Îsal ji bi heman armancê, mamosteyên herêma cezîrê ji bo tevlîbûna perwerdeyê li sê navendan hatin belavkirin.
Derbarê perwerdeya mamosteyên bexçeyên zarokan, Rêvebera Bexçeyên Zarokan a Herêma Cizîrê Semîra Hacî ji rojnameya me re axivî.
Semîra Hacî diyar kir ku ji sala 2015’ an ve ew beriya destpêkirina werzê xwendinê, perwerdeya biranşan didin mamosteyan û wiha got: “Ji bo perwerdeya mamosteyan, îsal jî me sê navend vekirin; li Girkêlegê, Hesekê û Qamişlo, mamosteyên Amûdê û Tirbespîyê jî tevlî navenda Qamişlo bûn, li navenda Qamişlo mamoste li ser du beşan hatin belavkirin û her beşek şeş roj dewam dike. Beşa yekê ji 19’ê Tebaxê destpê kir û 24 Tebaxê de bidawî bû, hijmara mamosteyên beşdar bûyîn 86 mamoste bûn, herwiha beşa duyem jî ji 26’ê Tebaxê destpêkir û 31’ê Tebaxê bidawî bû, di vê beşê de jî 90 mamoste beşdar bûn.”
Semîra Hacî da zanîn ku armanca wan ji perwerdeyan pêşxistina asta mamosteyan e û wiha pê da çû: “Ji ber ku ne her kes li bexçeyan kar dikin akademî bû, ji ber vê yekê me perwerdeya biranşan dan, da ku mamosteyan fêr bikin ji aliyê danûstandinê, têkiliyên wan bi zarokan re û da ku bikaribin vê zarokê fêrî jiyan, tîp ,hijmaran jî bikin, em bi hemû hewildanên xwe wan fêrî çand, exlaq û dîrok dikin û bikaribin bingehê wan avabikin û mamosteyan fêrî danûstandinê wan bi malbatan re jî dikin, herwiha me semîner li ser nexweşiyên zarokan dan, weke nexweşiya tenêbûn, tirs, bihintengbûn û yên ser hişk, her pirsgirêkek û çareseriya wê didin.”



Semêra Hacî



Lorîn Ehmo

## Tekezkirin li ser perwedeya rast

Semêra Hacî daxuyakirin ku di perwerdeyê de ne tenê mamoste tevlî dibin, alîkar jî hene ew jî van semîneran dibin û ev kesên alîkar dikevin şûna mamosteyan gava mamoste bihinvedanê distînin, lewma divabe ew jî şêwazê danûdstandinên bi zarokan re bizanibin û wiha dawî li axaftina xwe anî û got:” Asta mamosteyan bi giştî başin û serkeftî ne ji ber ku piraniya wan bawernameyên zanîngehan bi wan re heye wek; bawernameya derûnasî, civaknasî, mamosteyên refê. Daxwaza min hertim mamoste lêkolîna bikin û ev lêkolîn jî bisûd bin da ku di perwerdeyê de bikar bînin û ez dikarim tekez bikim heger her kes û her mamosteyek guh bide xwendekarên xwe wê xwendekarên serkeftî derkevin ne kêmî zarokên Ewropiyan. Perwerde bingeha pêşxistina mamosteya ne.”

## ‘Perwede geşkirina rihê hevaltiyê ye jî’

Têkildarî heman mijarê mamosteya bi navê Lorîn Ehmo da xuyanîkirin ku ew rojane ji bajarê Tirbespiyê ji bo perwerdeyê tên û wiha got: “Ji me tê xwestin em destpêkê zimanê dayîkê zanibin, çawa derbasî bexçê zarokan bibin û bi çi awayî zaroka bi rêve bibin him ji aliyê paqijî, rêzgirtin, çalakî, wane û wêneyan de. Ez heyanî niha tevlî çar perwerdeyan bûme . Kumisyonên me bi şêwazekî gelek xweş didin û rihê hevaltiyê û dil nizimbûn li cem wan heye, derfetê didin mamosteyan ku bi axivin nêrîn , astengî û pêşniyarên xwe bêjin.”

## Astengiyên ku dikevin riya mamosteyan

Mamoste Lorîn Ehmo dawî li axaftina xwe anî û wiha got: “Em gelek zehmetiyan bi zarokan re dibînin ji ber ku di vî temenî de ev cara yekem zarok ji dayîka xwe qut dibe, em hewl didin bibin dayîk ji vî zarokî re û alîkariya wî bikin nêzîkatiyê xwe pêre çêkin ji ber ku zarokin hene ezezîtî bi wan re ye naxwazin kes nêzî wan û tiştên wan bibin, em dibin alîkar pê re ku hêdî hêdî ji vê yekê derbas bibe. Daxwaza min ku em baştir li ser bexçeyê zarokan bisekinin û heger derfet hebe em van bexçan ji aliyê cih,astê ve pêşbixin û ji malbatên van zarokan jî dixwazin ku ew bi me re alîkar bin.”



# ‘Hêzên li pişt 12’ê Îlonê û dîktatoriya faşîst a AKP-MHP’ê heman hêz in’

Endamê Komîteya Navendî ya PKK’ê Cemal Şerîk anî ziman ku hêzên li pişt 12’ê Îlonê û yên li pişt dîktatoriya faşîst a AKP-MHP’ê heman hêz in û got, armanca van hêzan qirkirina Kurdan e.

**Navenda nûçeyan**

Endamê Komîteya Navendî ya PKK’ê Cemal Şerîk bi wesîleya salvegera darbeya leşkerî ya 12’ê Îlona 1980’yî axivî.
Cemal Şerîk balkişand ser darbeya faşîst a 12’ê Îlona 1980’yî wiha û got “Dema ku têkiliya navbera azadiya Rêber Apo û azadiya Kurdistanê hate destnîşankirin, divê têkoşîna li hemberî dîktatoriya faşîst a AKP-MHP’ê jî bi rengekî hevgirtî bê nirxandin ku rewşa nû ya darbeya faşîst a mêtinger-leşkerî ya 12’ê Îlona 1980’yî ye.”
Cemal Şerîk anî ziman ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li Îmraliyê di nava tecrîdeke giran de dîl tê girtin û got, “Di nava van şert û mercan de jî xwe weke mirovê herî azad ê cîhanê dibîne. Ev yek di gava destpêkê ya Tevgera Apoyî de jî, di nava şert û mercên darbeya faşîst a leşkerî, mêtingerî ya 12’ê Îlona 1980’yî de jî bi heman rengî bû. Eger Rêber Apo temsîla pîvanên azadiyê yên rasteqîn di şexsê xwe de şênber nekiribûya, Şoreşa Kurdistanê îro nikarîbû ewqasî bi pêş ve biçûya, Paradîgmaya Demokratîk, Ekolojîk û Azadîparêziya Jinê bibûya malê tevahiya mirovahiyê”

## ‘Armanca wan tunekirina Rêber Apo û gelê kurdistanê bû’

Cemal Şerîk wiha dewamî da axaftina xwe û got: “Ji aliyê azadiyê ve divê mirov têkiliya navbera têkoşîna Rêber Apo ya li dijî darbeya faşîst, leşkerî, mêtinger a 12’ê Îlona 1980’yî û têkoşîna di nava şert û mercên dîlgirtî yê tecrîdê de li ser vê bingehê destnîşan bikin. Ev şêweyê têgihiştinê wê bike ku têkiliya navbera darbeya 12’ê Îlona 1980’î û dîktatoriya faşîst a AKP-MHP’ê jî bi rengekî rast bê danîn. Lewma hêzên ku di dema destpêkirina Tevgera Apoyî de li ber rabûn, yên ku bi darbeya 12’ê Îlona 1980’yî re xwestin PKK’ê tasfiye bikin û Kurdan qirbikin û hêzên ku îro dîktatoriya faşîst a AKP-MHP’ê kirin desthilatdar û dixwazin bigihêjin armanca xwe ya dawî, heman hêz in.”

## ‘Kevneşopiya têkoşîna li dijî 12’ê îlonê divê di asta herî bilind de bê temsîlkirin’



Cemal Şerîk da zanîn ku êrîşên qirkirina Kurdan ku li Îmraliyê di şexsê Rêber Apo de tê kirin li Kurdistanê û derveyî welat li dijî gelê kurd bi tundî dewam dikin û wiha got: “Di salvegereke nû ya 12’ê Îlonê de, li dijî zextên faşîst, mêtinger û qirker ên ku li dijî Rêber Apo, PKK’ê, berxwedêrên zindanan û gel têne kirin, divê seknek bê nîşandan û têkoşînek bê kirin. Divê têkoşîna li dijî mêtingerî û faşîzma 12’ê Îlonê dewr bê wergirtin û hîn bêhtir bê xurtkirin. Ji bo vê jî divê li dijî şopdarên 12’ê Îlonê têkoşîn bi rengê herî çalak bê meşandin. Di salvegereke nû ya 12’ê Îlonê de divê ev wezîfe û berpirsyarî bi cih bêne anîn.”

# Konferansa Partiya Çepên Kesk bi 24 biryaran bi encam bû

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Di konferansa Partiya Çepên Kesk de ku du rojan dewam kir, 24 biryar hatin girtin. Bênavber têkoşîan li dijî tecrîda li Îmraliyê û di hilbijartinan de ji aliyê gel ve diyarkirina namzetan hin ji van biryaran e.**

Konferansa Partiyiya Çepên Kesk a li Navenda Kongreyê ya Nazim Hîkmetê ku du rojan dewam kir, bi dawî bû. Partiyê piştî hilbijartinan pêvajoya jinûvesazkirinê dabû destpêkirin, civînên gel çêkiribûn, komxebat û atolye li dar xistibûn û rexne û pêşniyazên gel girtibûn. Di vê konferansê de jî hemû rexne û pêşniyaz hatin bilêvkirin.
Di encama konferansê de 24 biryar hatin girtin. Bênavber têkoşîna li dijî tecrîda li Îmraliyê û di hilbijartinan de ji aliyê gel ve diyarkirina namzetan hin ji van biryaran e.
Biryarên hatin girtin dê di meha Cotmehê de di kongreyê de bên berpêşkirin. Sernavên biryarên hatin girtin jî wiha ne:
)Di meseleya Kurd de çareseriya demokratîk û aştiyane, siyaseta demokratîk, rêya Sêyem û tifaq, li dijî rejîma qeyûma em ‘di rêveberiyên herêmî yên demokratîk de’ israrker in, azadî û wekhevî ji baweriyan re, peywireke bivênevê: Rêxistinkirina kedê, aboriya demokratîk û gelparêz, piştevaniya li dijî erdhej û karesatan jiyan e, li dijî tiryakê têkoşîneke topyekûn, çapemeniya azad nayê bêdengkirin, lîsteya Meclisa PArtiyê û hevserok û lijneyên din, wê di hilbijartinên giştî û herêmî de gel namzetên me diyar bike, gavên rêxistinî yên ji bo jinûvesazkirinê, em ê komara demokratîk ava bikin, li dijî polîtîkayên şer û tecrîdê aştî û çareserî, girtîhgeh û binpêkirinên mafan û girtiyên nexweş , têkoşîna li hemberî sûcên li dijî xwezayê, tov zîl didin , polîtîkayeke astengdraiyê ya adil û xweser, li cîhaneke bêsînor biratiya gelan, bi zarokan re ber bi siberojeke azad, bilindkirina têkoşîna ji bo mafê zikmakî, piştgiriya ji bo jiyaneke pirzimanî, çand û huner, pêkanîna bernameya dibistana partiyê û Meclisa Ciwanan.)




# Hezkiriyê welat koça dawî kir

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Hunermendê Kurd yê navdar Beytocan ku demeke dirêj li Swêdê ji ber nexweşiya kanserê dihate dermankirin, jiyana xwe ji dest da.**



Malbat û dostên hunermendê kurd yê navdar Beytocan ragihandin ku hunermend Beytocan ê 68 salî vê sibehê li Stockholmê koça dawî kir. Beytocan demeke dirêj ji ber kanserê dihate dermankirin. Beytocan beriya demekê emeliyateke giran derbas kir, beşeke ji çenga wî hate jêkirin û parçeyek ji lingê wî lê hatibû bicihkirin. Lewma jî bi zehmetî diaxivî.
Beytocan di jiyana xwe ya hunermendiyê de 4 albûm weşand. Albûma wî ya ‘Yan mirin yan Diyarbekir’ li Tirkiyeyê hate qedexekirin. Beriya jiyana xwe ji dest bide, di hevpeyvînekê de diyar dikir ku di nava bêderfetiyê de wî karên xwe yên hunerê kiriye.
Beytocan ku navî wî yê rast Beytullah Gunerî, di 1’ê Cotmeha sala 1955’an li navçeya Farqînê ya Amedê ji dayik bû, di 8 saliya xwe de mala wan hatiye Amedê.
Di dema darbeya leşkerî ya faşîst a 12’ê Îlonê de hate girtin û 15 salan cezayê girtîgehê lê hate birîn. Ew nêzî 6 salan li girtîgehê hate hiştin û sala 1987’an hate berdan.
Beytocan sala 1990’î kaseta xwe ya destpêkê ya muzîkê derxist, piştî salekê jî di sala 1991’ê de neçar ma koçî Swêdê bike.
Beytocan piştî 23 salan cara yekem sala 2014an çûbû Amedê û konser dabû. Hunermendê Kurd Beytocan bi hesreta welêt li xerîbiyê koça dawî kir.
Ji stranên wê yên herî zêde ku di nava gelê Kurd e hatiye guhdarkirin û hezkirin, her; Agir Ketiye Dilê Min, Ji Te Dûrim, Zenga Zenga Dilê Min, Her Tişt Vire, Lo Dilo, Gula Zer, Diyarbekir Mala Min û bi 10’an Stranên din. Hêjayî gotinê ye ku stranên Beytocan ji aliyê gelek hunermendên kurd ve hatine gotin.

# Emîne Osê: Operasyona 'Xurtkirina Ewlehiyê' planên li hemberî heremê têkbirin

Cîgira hevseroketiya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Emîne Osê destnîşan kir ku operasyona 'Xurtkirina Ewlehiyê' gelek planên mezin ên li dijî Rêveberiya Xweser têk birin.

Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) di 27'ê Tebaxê de operasyona "Xurtkirina Ewlehiyê" li dijî şaneyên DAIŞ'ê, bazirganên narkotîkê û kesên ji derveyî qanûnê tev digirin li Dêrazorê dabû destpêkirin. Hemwextî operasyonê hin aliyan xwestin fîtneyê di nav pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de derxin.

Der barê mijarê de, Cîgira Hevseroketiya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Emîne Osê got.

Emîne Osê di destpêka axaftina xwe de sersaxî ji malbatên şehîdên operasyonê re xwest got: "Operasyona 'Xurtkirina Ewlehiyê' ne ewqasî hêsan bû wek ku hinekan texmîn dikir, lê belê planeke mezin û aliyên ji derve hebûn ku hewl dan aramî û ewlehiya Dêrazorê têk bibin."



Emîne Osê diyar kir ku li ser daxwazên domdar ên şêniyên Dêrazorê, QSD'ê û Hêzên Ewlekariya Hundirîn dest bi operasyona 'Xurtkirina Ewlehiyê' kir û got: ``Piştre mezinahiya planên li dijî herêmê û rola hikumeta Şamê, dewleta Tirk û Îranê diyar bû ku bi îsrar hewl didan fîtne di navbera Kurd û Ereban de biafirînin. Bi saya hêzên me tevahî hewldan hatin têkbirin. Hêzên me roleke erênî di peydakirina îstiqrarê li Dêrazorê pêk tînin."

Emîne Osê bal kişand ser hevgirtina pêkhateyên herêmê jî û wiha pêde çû: " Tevahî pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hevgirtî ne. Pêkhateyan bi îsrar kedeke mezin da û girîngî dane vê xalê ku tu fitniyeke neteweyî li ser esasê Kurd û Ereb tune ye, lê operasyon ji bo xurtkirina ewlehiyê û li dijî şaneyan bû ku hewl didan ewlehî û istiqrara herêmê têk bibin. Tevahî pêkhateyan ev helwest nîşan da. Pêkhateyan destek dan hêzên leşkerî yên operasyonê.``

**`Zanebûn û hevgirtina gel plan têk birin`**

Emîne Osê diyar kir ku armanc kesayet û dewletên çavbirçî negihiştin serî û ev li gotinên xwe zêde kir: "Ji rojên pêşîn de rejîmê destek da hin koman da ku operasyonê dirêj bikin û di encamê de sûdê bigirin. Di heman wextê de jî çeteyên girêdayê Tirkiyeyê êriş li dijî Til Temir û Minbicê dan destpêkirin. Armanca wan ew bû ku bala li ser operasyona ewlehiyê ya li Dêrazorê berbelav bikin. Lê zanebûna gelê me ji her kesî re îsbat kir ku operasyona Xurtkirina Ewlehiyê ya li Dêrazorê tevahî planên Tirkiye, hikumeta Şamê, Îranê û komên ku xizmetî ajnîdeyên van dewletan dikirin, pûç kirin.``

Emîne Osê wiha domand: "Planên wan têk çûn, lê ev nayê wateya ku ew êdî hewl nedin careke din aramiya herêmê û projeya Rêveberiya Xweser têk bibin. Ji dema damezirandina Rêveberiya Xweser de ev alî bi hemû rêbazên leşkerî û balafirên bêmirov, bi rêya ambargoyê, şerê taybet û afirandina fitneyan di navbera pêkhateyên herêmê de, şerê vê rêveberiyê dikin."

**Pêngava xizmetguzariyê**


Emîne Osê diyar kir ku piştî paqijkirina Dêrazorê ji şaneyên çeteyan û yên xirabker dê li gorî derfetên heyî pêngaveke pêşxistina projeyên xizmetguzariyê hebe û wiha dawî li axaftina xwe anî: ``Rêveberiya Xweser gihaştiye vê encamê ku dijmin hîna hewl dide projeya me têk bibe, lê ji hevgirtin, xebateke cidî û parastina destkeftiyên ku bi fedakariyên şehîdan hatine bidestxistin, ji me tê xwestin." **ANHA**

# `Ji bo serxistina xwepêşandanan divê proje hebin`

**Aktîvîsta femînîst Sîlvart Selûm bal kişand ser beşdariya jinan di xwepêşandanên li Siwêdayê de got, "Divê beşdarbûneke xurt di qada bîrdozî de jî hebe û ji bo serxistina xwepêşandanan divê projeyek bê danîn."**

Ji destpêka xwepêşandanên li Siwêdayê de beşdariya jinan û bangên wan ên ji bo azadî, jiyaneke bi rûmet û pêkanîna çareseriyeke siyasî ji bo krîza Sûriyeyê balê dikişîne.

**Xwepêşandên ku li ser projeyekê hatine avakirin bi bin nakevin**



Ji deverên din ên Sûriyeyê jin piştgiriya xwe ji daxwazên xwepêşandêrên li Siwêdayê re nîşan da. Der barê vê mijarê de aktîvîsta femînîst û endazyar a ji Helebê Sîlvart Selûm weha anî ser ziman. Sîlvart destnîşan kir ku xwepêşandanên li Siwêdayê encama zexta li ser gel e.

Sîlvart got: "Ez piştgiriyê didim xwepêşandanên li Siwêdayê ku beşdarbûna jinan tê de balkêş e. Ev xwepêşandan di encamê zextê de derketin. Lê belê divê di serî de projeyek û planek li ser erdê hebe da ku ev xwepêşandan bi ser kevin û daxwazên xwepêşandêran bên bicihanîn."

Der barê rêbazên parastina van xwepêşandanan ji têkçûnê de Sîlvart Selûm got: "Dema ku ez banga guhertinê dikim divê pêşî projeyek min a zelal hebe, nabe ez bi gotinan tenê bang bikim, lê divê ez ji şaştiyên di xwepêşandanên berê yên têkçûyî de ders bigirim û berê xwe bidim çareseriyên siyasî û aştiyane."

**Divê destwerdana derve bê redkirin**

Sîlvart ev li gotinên xwe zêde kir: "Bangkirin erka her kesî ye. Lê ji ber destwerdana ajandeyên derve li xwepêşandanên berê ku destpêkê aştiyane bûn, xwepêşandan veguherîn tundiyê. Ji ber wê jî divê xwepêşandan baş werin plankirin û demek ji bo bicihanîna daxwazên xwepêşandêran bê diyarkirin."

Aktîvîst Sîlvart destnîşan kir ku divê jinên sûriyeyî bi zanabûn û hişmendî û jîrî tev li xwepêşandanan bibin û cihê xwe di plankirinê de bigirin.

**'Em ê bi zanabûna xwe fikrên xwe pêk bînin'**

Sîlvart Selûm di dawiya axaftina xwe de got: "Divê beşdariya jinan di xwepêşandanan de di çarçoveya banga guhertina siyasî û hildana pankartan de sînordar nemîne, lê divê jin bibin xwedî fikr û ji bo pêkanîn fikrên xwe tev bigerin. Em jin divê di radeya yekemîn de hevgirtî bin û bibin yek."

# Di çêbûna gerdûnê de meyla azadiyê

**Volqan Elî**

Êdî di serdema me de bi taybetî di sedsala 21'an de ji aliyê zanistê ve hatiye piştrastkirin yan jî li ser hemfikirbûnek pêk hatiye ku gerdûna me ya niha em di nav de jiyan dikin, 20 milyar sal ji beriya vê çêbûye. Ji beriya ku gerdûn çêbibe rewşa ti sekn û helwestên werin pênasekirin li holê tinebûne. Jixwe hol yan jî meydanqadek ku pênaseyeke bi vî şiklî bibe, tê de were tarîfkirin jî tinebûye. Tenê li ser vê yekê em dikarin bînin ziman, eger mirov karibe behsa heqîqeteke bi vî rengî bike ew jî dikeve nav çarçoveya zanista kuantumê. Hûrguliyên vê mijarê raxistin li ber çavan û heta piştî ku gerdûna me çêdibe çîroka wê anîn, û bi afirîna cîhanê ve girêdayin bi serê xwe mijareke lêkolînê ye. Tenê em dixwazin di çêbûna gerdûnê û heta bi çêbûna cîhana me de bidin li ser şopa pênaseyek ku ji bo civaka mirovahiyê jê neveger e yanî 'azadiyê', kok û binerata wê di van mercan de lê bikolin. Piştre dema şert û mercên cîhanê ji bo jiyankirina curê jê re tê gotin mirov guncaw bûn, vê têgînpênase û rewşa ku bi azadî tê tarîfkirin di çêbûna civaka mirov a destpêkê (klan) de bi çi rolê rabûye, lêkolîn bikin. Li gerdûnê, li cîhanê, di nav xwezayê de her tişt bi rewşa xwe ya dualîte tê naskirin. Heta ji vê jî zêdetir mînak beriya ji çêbûna gerdûnê (êdî ev qada lêkolînê ya kuantumê ye ji ber wê yekê em tenê dikarin hin nêzîkbûnên felsefîk bînin ziman) hêvinê gerdûna me ya niha ji 'tinebûn' û 'hebûnê' pêk dihat. Lê dîsa jî li meydanê (em neçar in hin gotinan ji gerdûna me ya niha bi deynê xwe bistînin) 'hê' jî sentezek (gerdûn) yan jî tiştekî nû tine bû. Her ku 'hebûnê' xwest xwe pênase bike, pêwîstî bi 'tinebûnê' dît. Yanî 'hebûnê' karîbû xwe bi 'tinebûnê' bide destpêkirin, vebibe û bibe gerdûn (sentez). Dibe ku xwendekar bêjin çi têkiliya vê bi azadiyê re heye? Rast e tenê me xwest em rewşa dualîteyê di çêbûna gerdûnê de, heta ji wê jî pêştir beriya ji çêbûna gerdûnê raxin li ber çavan. Belkî jî li nav sînorên gerdûnê û ew qada ku meydana zanista kuantumê ye, tenê heqîqateke şîrîk hebe ew jî rewşa dualîteyê be. Herî kêm ev ji bo hêvinê gerdûna me ku ew welidandiye derbasdar e. mirov dikare bêje hemû sekn û pênase û heqîqatên di gerdûna me ya niha de hatine pênasekirin, di wê çarçoveya tovê gerdûnê de bi awayekî razayîbûn: wekî sekneke herî esasî ya heqîqata gerdûnî 'azadî' jî di nav de.

Piştî ku di encama teqîna mezin (bing bang) de ku weke teqandineke pir mezin tê pênasekirin gerdûn çêdibe, di heman kêliyê de firehbûna gerdûnê jî dest pê dike. Ji ber têhn û hecmê destpêkê yê gerdûnê de forma made ku îro li gerdûnê heye, hê pêk nehatibû. Her tişt di rewşa xwe ya enerjiyeke bê ser û ber ya serbestmayî-azadbûyî û bi lezeke pir mezin hewl dida xwe bigihîne asteke hê bilindtir a azadiyê de bû. Weke tê zanîn îro jî li gerdûnê, li cîhanê û li her dera were bîra me ti şiklên enerjiyê bi dest nayên girtin, nayên qeyd û bendan. Mînak, piştî ku mirov pêlî kepsa fenerekê dike, ew enerjî-şewqa serbest dimîne ku di nava kefa destê me de bû di nîv saniyeyê de xwe li ser heyvê dide û di heşt deqayan de xwe berdide li ser tava me ya ku germahiya wê digihîje milyon derece germahiyê. Peleke kaxizê ya têra xwe zuwa û hişk, dema yek agirekî bide aliyekî wê, qirçeqirç pê dikeve û di dawî de dibe xwelî. Hem enerjiya deng bi şiklê qirçeqirç û hem jî bi şiklê germahî, ronahî li hewîrdorê belav dibe. Yanî dema ji ber destwerdana me beşeke biqasî were paşguhkirin pir zêde biçûk a kutleya wê kaxizê, weke enerjiya nava wê azad dibe, êdî nayê qeyd û bendan.

Dîsa Rêber Apo azadiya ku weke pênaseyek civakî tê zanîn dişibîne helwesta enerjiyê. Azadiyê tenê bi çarçoveya civakî teng nagire dest. Dibêje "ji ber ku di enerjiyê de helwestek bê serûber a tevgerê heye, nêzîkî azadiyê ye". Bi rastî jî ji aliyê zanista kuantumê ve hatiye vedîtin û piştraskirin ku zereyên herî biçûk ên made (kuanta) ji paketokên enerjiyê pêk hatine. Yanî dema em destê xwe diavêjin pênûsekê, parçeyek dar û ber yan jî kulmek ax di nava kefa destê me de enerjiyeke nêzîkî bê dawîbûnê veşartiye. Ev enerjî bi awayê paketokan hatiye sînordarkirin, hatiye îstîfkirin. Êdî ew serbestî û azadiya bêdawî bi formeke diyar hatiye sînordarkirin.

Helwest û sekna gerdûnê ya hema kêliya piştî teqîna mezin (biing bang) pir nêzîkî azadiya bêdawî ku ji vê pênaseya 'bêdawî', fîzîknasên wekî Einstein zêde hez nakin, li meydanê hebû. Ji ber ku hemû gerdûn di rewşa xwe ya enerjiyê de bû, bi qasî ku têra hemû hejmarên bîrkariyê bike li ber wê bijartertekên cuda hebûn.



# Malbatên Şehîdan: PDK'ê di xiyaneta gelê kurd e bi israre

Malbatên Şehîdan yên bajarê Qamişlo diyar kirin ku PDK`ê dijminatiya xwe li dijî hebûn û azadiya gelê Kurd herdem nû dike û gotin, emê li ser xeta şehîdên azadiyê têkoşînê dewam bikin û xayînan têk bibin.

**Avêsta Menaf/Qamişlo**

PDK'ê herdem ji bo berjewendiyên xwe, bi dijminê gelê kurd re peymanên veşartî imze dike û plana li dar dixe. Herwiha herdem li pêşiya azadiya gelê kurd bûye kelem ji dijmin re bûye destek. Ji destpêka avabûna Tevgera Azadiya Kurdistanê û heta niha, PDK'ê ji dagirkeriya Tirk re bûye destek û herdem li dijî doza gelê kurd kar kiriye. Di êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên li ser Qadên Berxwedanê yên dawiyê de , PDK'ê bi awayekî eşker li kêleka dagirkeriyê cihê xwe digre, herwiha li Rojava jî xiyaneta wê ya bi gelê kurd re ji her kesî re zelal e. Derbarê xiyaneta PDK'ê ya li dijî gelê kurd û Tevgera Azadiya Kurdistanê, endamên Saziya Malbatên Şehîdan ya bajarê Qamişlo ji rojnameya me re axivîn.

**'Zarokên me bi destê PDK`ê şehîd dibin'**

Endama Saziya Malbatên Şehîdan, dayîka Şehîd Sozadar Ibrahîm, Bedriya Hiso diyar kir ku ev ne carê yekê ye ku PDK'ê xiyaneta gelê Kurd dike û wiha got: "Xiyanetên PDK`ê û tiştê ku bi serê gelê kurd e anîn e di rûpelên dîrokê de hatiye nivîsandin. PDK'ê li dijî tevgerên kurdan herdem bi dijmin re bûye yek, ji destpêka avabûna Tevgera Azadiyê de, PDK'ê li kêleka dagirkeriya Tirk şerê Tevgera Azadiyê kiriye û hewil daye wê têk bibe. Bi 10'an zarokên me bi destên mala Berzanî şehîd ketin e."

**'Em ê xeta şehîdên azadiyê dewam bikin'**

Bedriya Hiso di dawiya axaftina xwe de da zanîn ku hevkariya PDK`ê ya bi dewleta Tirk re sînorê xiyanetê jî derbas kiriye û wiha got: "Em hemû dibînin ku li Rojava çi diqewime, her roj êrîş li ser gelê me tê kirin, zarokên ku tu sûcê wan nîne ji aliyê dagirkeriya Tirk ve tên qetil kirin. Li vir PDK'ê bi xiyaneta xwe hazir û piştgiriya dagirkeriyê dike. Em weke dayikên Şehîdan soza ku me daye Rêberê xwe Abdullah Ocalan biparêzin û xeta şehîdên xwe bidomînin."

**'PDK`ê xiyaneta xwe her dem nû dike'**

Di heman çarçoveyê de hevserokê Saziya Malbatê Şehîdan Mehsûm Hesen da zanîn ku dewleta Tirk ji bo tunekirina Tevgera Azadiyê, herwiha ji bo şikandina îradeya azadiyê ya gelê Kurd, bi hemû hêza xwe êrişî destketiyên gelê Kurd dike û wiha got: "PDK`ê dijminatî û xiyaneta xwe ya bi Tevgera Azadiyê re nû kir û bi vî rengî piştgiriyê dide her cûre planên ji bo lewazkirina Tevgera Azadiya Kurdistanê. Dewletên mêtinger ên li herêmê jî destekê didin êrişa li dijî Tevgera Azadiyê, ku tevgera Azadiyê yek ji dînamîkên herî girîng ên antîemperyalîst e û ji bo rêveberên emperyalîst weke gefekê tê dîtin. Lewra êrişên li Başûrê Kurdistanê yên li ser Tevgera Azadiyê, ji bo têkoşîna azadiyê ya li herêmê metirsiyeke mezin e."



**Bedriya Hiso**



**Mehsûm Hesen**

**'Dewleta Tirk a faşîst dixwaze gelê kurd parçe bike'**

Mehsûm wiha berdewamî da axaftina xwe û got: "PDK`ê, a ku li ber hewldanên yekîtiya neteweyî ya gelê Kurd radibe, bi hevkariya xayin a bi dewleta Tirk a faşîst re dixwaze gelê kurd parçe bike, ji bo ku karibe her devera Kurdistanê dagir bike. PDK`ê xiyanetê li daxwazên gelê Kurd ên ji bo diyarkirina çarenûsa xwe û azadiyê dike. Di vê ev plan bê têkbirin û piştgiriya navneteweyî ya bi gelê Kurd re bê birêxistinkirin.

**'PDK'ê li ser bingeha xiynetê hatiye avakirin'**

Mehsûm diyar kir ku ger rêvebiriya PDK'ê xwe ji vê rewşa hevkarî û xulamtiyê xelas neke û neyê xeta neteweyî ya azadiya gelê kurd, dê tinebûnek mezin bijî û wiha domand: "Divê PDK'ê bizanibe ku xeta hevkariya dijmin ya ku ew temsîl dike têk diçe. Her wiha li herêmê ji ber hevkariya dewleta tirk û PDK'ê tê zanîn ku li ser bingehê qirêj hatiye avakirin, kes bawerî bi piştgiriya Tirkiyeyê jî nayîne. Her kes dizane ku di bingeha vê hevalbendiyê de dijminantiya gelê kurd heye. Lewra ji gelek aliyên cuda nerazîbûn tên. Lê ev nerazîbûn di van demên dawî de derket astek cuda."

**'Ma ne bese ji xiyanetê re'**

Hevserokê Saziya Malbatên Şehîdan ya bajarê Qamişlo Mehsûm Hesen di dawiya axaftina xwe de bang Partiya Demokrat a Kurdistanê PDK`ê kir ku dest ji xiyaneta xwe berde û wiha got: "Em wekî malbatên şehîdan li bakur û rojhilatê Sûriyê kiryarên PDK'ê û xiyaneta wê ya bi gelê kurd re bi tundî şermezar dikin. Herwiha em bang PDK'ê dikin dest ji xiyanet û rijandina xwîna gelê kurd berde û jê re dibêjin"Ma xiyanet ne bes e."

# 'Tecrîd binpêkirina tevahî zagonên navneteweyî ye'

**Navenda nûçeyan**

**Hevseroka Yekitiya Parêzeran a Herêma Cizîrê Nisrîn Osman diyar kir ku tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan tê meşandin li dijî tevahî qanûnên navneteweyî ye, û destnîşan kir ku ew ê heta azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêkwere têkoşînê dewam bikin.**

Dewleta Tirk a dagirker binpêkirinên xwe yên li dijî Rêber Abdullah Ocalan didomîne. Cezayên nû li wî birîn, tecrîda li ser wî girantir kir û ev zêdetirî 2 sal û nîve ku hevdîtina parêzer û malbata Rêber Abdullah Ocelan hatiye qedexekirin.

Parêzerên Herêma Cizîrê di 31'ê Tebaxê de plana lidarxistina semînerên derbarê rastiyên qanûnî yên girêdayî doza Rêber Abdullah Ocalan de, ragihand. Yekemîn semîner li hola Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) ya Qamişlo lidar xistin, herwiha bi armanca ku rastî û ramanê Rêber Abdullah Ocalan di nava civakê de hîn zêdetir were naskirin.

Di derbarê tecrîda giran û rastiya Rêber Abdullah Ocalan û jiyana wî de, Hevseroka Yekitiya Parêzeran a



Herêma Cizîrê parêzer Nisrîn Osman ji rojnemeya me re axivî.

**'Revandina kesayeteke siyasî mîna Rêber Abdullah Ocalan sûcê herî mezin e '**

Nisrîn Osman diyar kir ku Rêber Abdullah Ocalan ji zaroketiya xwe de rêberek bû û ji bo doza delê kurd têkoşiya: "Em tev deyndarên Rêber Abdullah Ocalan in û divê ji bo azadiya wî ya fîzîkî xebatê bidomînin. Her wiha di qanûnê de, girtina kesayetek siyasî bi rêya komployekê sûcek e. Kelepçekirina destê girtiyê siyasî di dadgehê de jî sûcek e, ev sûc tev ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve li dijî Rêber Abdullah Ocalan li ber çavê cîhanê pêk hatin û hîna pêk tên. Sedema sereke ya bêdengiya Neteweyên Yekbûyî (NY) derbarê rewşa Rêber Abdullah Ocalan de, bi cihanîna daxwazên dewletan ye ku di şerên cîhanê yên yekem û duyem de bi ser ketine. Ev dewlet jî li çarenûsa gelên cîhanê kontrol dikin û hêzên veşartî hene ku rewşê kontrol dikin."

**Semînerên ku ji bo rastiya Rêber Apo li darxistine**

Nisrîn wiha berdewamî da axaftina xwe û got: "Em wekî parêzer çalakiyek hat li darxist, ev çalakî jî wek welatiya, mafxweaz û wek parêzeran bi rengê semîner li ser rastî û jiyane Rêber Abdullah Ocalan hat dayin. Herwiha ev binpêkirina zagonan ku li ser Rêber Abdullah Oalan hat kirin, di zagonên dewletên navnetewî de, me pilanemeya xwe diyar kir ku semîner werin dayin, di meha Tîrmehê de me dest bi çalakiya xwe kir, herwiha li bajarê Qamişlo me li darxist, herwiha yê semîner li bajarê Hesekê were dayîn. Hemehingiya me bi Kongra Star re û ofîsa jin di hindirê TEV DEM`ê de, armanca me ji vê çalakiyê re, ku hîn bihtir û zêdetir jiyan û rastiya fikirê azad yê Rêber Abdullah Ocelan, herwiha tecrîda giran ye li ser Rêber Abdullah Ocelan tê kirin di mile hiqûgî de jî, di nava civakê de bidin naskirin, ku em çawa bikaribin azadiya Rêber Abdullah Ocelan a fîzîkî, pêk bînin."

**'Azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan emê pêk bînin'**

Hevseroka Yekitiya Parêzeran a Herêma Cizîrê parêzer Nisrîn Osman di dawiya axaftina xwe soza domandina têkoşînê heta pêkanîna azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan da û got: "Jin dikarin roleke mezin di vî alî de bilîzin ji ber ku azadiya me azadiya Rêber Ocalan e. Her wiha ramana Rêber Abdullah Ocalan, wek ronahiyê di nava civakê de ye û banga me li gelên welat parêzin ku li ber xwe bidin, ji bo pêkanîna azadiyê jî bi rêbazên nû zextê li hêzên mêtinger bike û azadiya gelên herêmê û azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan pêk bîne."



## Cûntaya12'ê Îlonê

**Farûk Sakik**

Di dawiya salên 70'yî de, li Kurdistanê jî nifşek nû derketibû. Ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd û ji bo Kurdistaneke azad, di nav hewldanan de bûn. Ji van rêxistinan yek jî PKK bû. Di 28'ê Mijdara 1978'an di bin rêberiya Abdullah Ocalan de damezirandina PKK'ê hatibû îlankirin. Ev partî ji rêxistinên din cuda û di nav gel de, di nav civakê de îtîbar dît.

Piştî ku damezirandina PKK'ê hat îlankirin û xebatên wê yên di nav gel de dest pê kirin, dewleta Tirk kete nav hewldaneke qirêj. Bi du tasfiyekirina vê tevgera nû ketibû.

Komkujiya Mereşê pêk hatibû û piştî demek bi operasyona Elezîz û îtirafên Şahîn Donmez, Rêber Apo dît gav bi gav darbeyek li dijî tevgera wan wê pêk were û berê xwe da Rojhilata Navîn.

Li vê derê amadekariya şerê gerîlatiyê dikir. Beriya 12'ê Îlonê, Mazlûm Dogan, Kemal Pîr û hin kadroyên din, ji bo amadekariya gerîlatiyê bikin vegeriyan welat û hatibûn girtin.

Di demekî wiha de li Tirkiyê, di 12'ê Îlona 1980'yî de, cûntaya leşkerî pêk hat. Bi dehan endamê vê tevgerê hatibûn girtin û li zîndana Amedê bûn.

Armanca sereke ya darbeyê jî, têkbirina Tevgera Azadiya Kurd bû.

Evren û hevalên wî, ji bo têkbirina Tevgera Azadiyê, serî li hemû rê û rêbazan dan. Pêkanînên dij-mirovahî bi hemû awayî pêk anîn.

Îdiaya wan ew bû ku di nava çend rojan de, dawî li Tevgera Azadiya Kurd bînin. Lê yên têk çûn û dawî li wan hatin, xwediyê wan gotin û îdiayan bûn.

Berovajî gotinên darbekaran, Tevgera Azadiya Kurd ya di pêşengiya Rêber Apo de, her pêş ket. Rêber Apo û PKK bû hêviya azadî û demokrasiyê ya bi mîlyonan kesan.

Şagirtên Rêber Apo û gerîlayên azadiya Kurdistanê, hemû planên dewleta Tirk a di nav çend rojan de hesabê tasfiyekirina PKK'ê dikir, xera kirin.

PKK'ê di 15'ê Tebaxa 1984'an de şer dabû destpêkirin. Ev rêxistinbûna PKK'ê bi Bakur sînorkirî nema û li hemû deverên Kurdistan belav bû.

Bi demê re li ser paradîgmaya Rêber Apo li Rojavayê Kurdistanê şoreşek pêk hat.

Gelek destkefityên Kurdan çêbûn.

Artêşa gerîla hat avakirin.

Li hemberî hemû êrişan gerîla îro berxwedaneke dîrokî didin meşandin.

Li hin navendên wek Mexmûr, Şengal û Rojava sîstema rêveberiya xweser hat îlankirin. Hemû gel di vê sîstemê de xwe îfade dikin.

Erdogan ji bo vê sîstemê tune bike dest bi êrişan kir.

Mîrasa berhema darbeya 12'ê Îlonê AKP girtibû û temsîlkariya darbekar Kenan Evren jî Tayîp Erdogan dikir.

Wê demê Evren qala yek ziman, yek dewlet û yek al dikir, niha jî Erdogan û AKP'î bi her wesîleyê dibêjin "yek ziman, yek dewlet û yek al."

Kenan Evrenê serdemê nû Erdogan, tunekirina PKK'ê ji xwe re esas girtiye.

Erdogan dijminatiya Kurdan de ewqas israrkir ku şerê li dijî Kurdan bû sedem li Tirkiyê qeyranê siyasî, aborî û civakî kûr bibe jî wî tu carî pes nekir. Ji van qeyranan jî sûd wergirt.

Dema ku wî li dijî PKK'ê ev şer da destpêkirin, di qada navnetewî de jî piştgiriyek girt. Komplo dan destpêkirin û Rêber Apo dîl hat girtin.

Ew difikirîn bi dîl girtina Rêber Apo wê siyaset û plana 12'ê Îlonê ji nû de bixin meriyetê. Lê biserneketin.

Rêber Apo hemû hemle-hewldan-planên wan vala derxist. Rabûn di sala 2015'an de şer û tecrîd bi hevre dane destpêkirin. Lê bi tu awayî bi ser neket. Êdî hêzên Kurdan yên ku van destkeftiyan biparêzin hebû.